A. Sıvar Yalçın

# Evina Qedexe

Helbest



ASO

A. Sıvar Yalçın

# Evina Qedexe

(Helbest)

**ISBN** 975 - 6925 03 5
**ASO YAYINLARI, 1997 - İSTANBUL**

**Birinci Basım**: Şubat 1998, Aso Yayınları

**Kapak Tasarım**: Fehim Işık
**Teknik Hazırlık**: Diacan Grafik / 0.212.519 45 49
**Baskı**: Yön Matbaası / 0.212.544 66 34
**Cilt**: Yalçın Mücellit / 0.212. 544 50 73

**ASO YAYINLARI**
Atatürk Cad. Köktaşı Pasajı No: 4/23 Maltepe / İstanbul
**Tel**: 0.216.383 96 21

A. Sıvar Yalçın

# Evina Qedexe

(Şiir)

ASO

## *Welatê mın*

Lı erd û lı esman
Bı hev ra ne, yek can
Helbet bıgıhên armanca xwe
Ku dest bıdın hev, bê guman

Jiyan xweş e
Xweş e jiyin
Evin dı hembêza te da
Welatê mın.

1990

## *Xeyal*

Evin
Aşıti
Bırati
Û roja ku hêvi dıçırıse

Nızam ez din bûme, çı ye?
Yan ji lı welatê
Lı ser ewrên Saint Morusê me
Vana
Tev xeyal ın
Xeyal.

1990

## *Gulek ım ez*

Dı guliyê xwe da
gulek ım ez
Dışele jı pelên mın
Dı hênikahiya şevê da
barana payizê
Bı helhatına rojê ra
vedıbe dılê mın
Guliyên mın bı dıri ne
Evin bar dıkım lı dılê evindaran
Jı çavên şıl ra hêvi.

1991

## *Yarek mın hezkır lı esman*

Esman dûr, esman roni
Tenê te dıbinım lı wan dera
Rûyê te yê bedew, porên te yên zêr dıbinım
Evîndar ım ez, lı vi esmani

Esman bêdeng, esman xemgin
Dılopek hêsır dıbinım lı çavên te
Rûyê te yê çılmısi, lêvên te yên ti dıbinım
Lanetê tinım lı vi esmani

Esman bı şin, esman tari
Roniyek dıbinım, dûr dıbe hêdi hêdi
Bı ewr ra lefandi canek dıbinım
Eşq û nefretê bir dıkım lı esmanê

Esman dûr, esman roni
Esman bêdeng, esman xemgin
Esman bı şin, esman tari
Lı asmên, esmanê dıbinım ez

1991

## *Hesret mam*

Hasret mam lı stêran
Lı roj û lı hiv
Qıbe qıba kewan, herıkandına robaran
Jı evin ra hesret mam

Bı dırêjahiya rojan
Dıgerım qimek roni
Dıbe ku hêvi bıde, jiyan bıde
Jı ber vê lê dıgerım

Jı çavek ra, jı dengek ra
Wek loqmek nan
Hesret mam
Hesret mam jı azadi ra.

1991

## *Darek ım dı nava çolê da*

Darek ım dı nava çolê da
Hışk nabın guliyên mın
Her tım bı hêvi ye dılê mın
Carcaran dıgirim

Bı hêsrên mın xwedi dıbın
Dıbışkıvın guliyên mın
Û bahozeki dıjwar tê
Dıweşın pelên mın, bê zeman

Nû kırın wext dıxwaze
Lê ez dareki rıkdar ım
Lı çolê dıjim
Û zıwati nas nakım ez.

1991

## *Çavên mın bırçi*

Çavên mın bırçi
Rıjiya hêsırek
Mina peleke payizê
Nısıli jı aleka mın
Dı tariya şevê da
Temırand agırê mın
hêviya mın

Lı ber serê mın
Gurek bırçi ye dızûre
Dı nav şeva bêdeng ra
Çemek westiyayi ye dıkışe
Bı bihna berbangê ra
Gulek e, pelên xwe vedıke
Û rojek e heltê
Têr dıke bırçitiya çavên mın.

1992

## *Rêwi*

Rêwiyeki dı behra din da
Ava çûna rojê temaşe dıke
Ki ye
        çı dıgere
                ku da dıçe
Xeribê mın ?
Evindar e çi ye, loo ?
Go nade dengê pêlan
Danaxwe lı ber ba û bahozê
Dıçe û tê
            ge lı wi ali
            ge lı vi ali
Mina bebıka lı dergûşê
Ber bı rojhelatê va vekıriye dılê rût
Natırse jı bırçitiyê
Natırse ew jı tariyê
Dûr e, rêka xeribê mın
Lê, şık tune
Zû yan dereng
Ewê bıgıhê evina xwe .

1992

## *Oy dayê*

Zıncırê zalım e dı hıstuyan da
Mina hêysırên dayıka mın
Oy dayê!
Ava kaniya te zıwa be
Bextê erdê mın reş e
Berde ez ji bıçım
Kulilk lı benda esmanê şin ın
Çavkani rêya delaliyê dışopinın
Berde dayê ez ji bıçım
Çengek av bıbım jı rojê ra
De berde mılên xwe ra
Bask kors kım dayê .

1993

## *Teyroka me*

Destê mın da teyroka me
Hêdi hêdi
Xızina tari ye tê
Û ruhdana xweza
Ruhdana jiyan
Teyroka me ye heltê
jı pışt çiyan
Hêdi hêdi
Gav bı gav
dıkışe ber esman

Destên mın da teyroka me
Carcaran wında dıbe
Ci ci ewr dıgrin
dıkenın çem û bostan
Û disa diyar dıbe
dıkenın ax û xweydan

Û gurmina dılek bı evin
An ji tık!.. tûka!.. saetek
Her çı be
Destên mın da jiyanek e, bê guman
Av germ e
Temar da xwin bê aram
Zeman teng e
Dem dereng e
Teyroka me dı riya xwe da dımeşe ...

Destên mın da teyroka me
Her rûken e
Bı hêvi ye
Lê, hêdi hêdi
Jı destên mın dışeqıte
Lez ke bıra
Destên xwe bıgıhine mın
Tu ji, ew ji
Werın, tevayi werın
Riya we çı dıbe bıla bıbe
Ev teyroka me hemûyan e
Dest bıdın hev
ku hêza me pırtır be
Nehêlın teyroka me
jı destên me bıfılıte

Destên me da teyroka me
Û dı çavên me da ronahiyek bêdawi
Gurmina dılên bı evin
Evina hezaran salan
Destên me da jiyanek e bê guman
Jiyan û azadi .

Gulan 1993

## *Evina qedexe*

Lı berojê rûnışti, çavên mın lı pey kevokan
Ava hênik zınaran dıterışand
Û şerê delav û pêlan, bı şev û roj
Wek ewrek derbas bûn awırên te
Porên te ba, kenê te bıhar e
Bûyi stêrek, te koç kır û jı mın dûr ket
Bınêr, aso xwin dıgri, dı avê da çel dıbe
Û behr germ, jiyan wek robar e dıherıke
Gul dıbare jı çavên wi, erd bihn dıde bınêr

Û zil dıde evina mın
Evina Ferhad û Şirinê birtine
Lê tu çıqa stêreke ji bıbi lı esman
dûr jı mın
Bir neke ev jı mın û te ra mexsûs
evinek qedexe ye
Tu axa wi dil
zmanê wi qedexe
û ez
Rıkdar ku lı ser vi erdi bihn dıde
û kılam dıbêje
Tu darek bı hezaran sal i
û ez
Pelek ku dı vi dari da dıbışkıve
lı bıharê şin dıbe
û lı payizê dıweşe
Belê, ev jı mın û te ra mexsûs
evinek qedexe ye .

1993

## *Gula sor*

Derbas bın ji
Roj, meh û demsalan
Derbas bın ji
Ewr, çıvik û pelan
Raneke gula sor
                    bıla razê
Dıbe ku wê bêtır bıkene
                              jı sıbê ra
Bêtır wê bıbırıqe
          dı guliyê xwe yê germ da
Raneke gula sor
                    bıla razê
Dı xewna xwe da azad e
Ew .

1993

## *Jı te hez dıkım*

Hez dıkım jı te
Çavên te
Porên te
Kenê te
Tu ji wek mın
Bı hêvi
Tu ji wek mın
Bı evin i
Germitiya te
Nariniya te
        mina pelek payizê ku dıweşe
Tu ji wek mın tenê
Bê helbest û bê xwedi
Belki ji jı ber ku tu yi
Nızanım çıma
Lê hez dıkım jı te.

1993

## *Bı dırêjahiya temenek*

Dı tariya şevê da
Lı ser mılên xwe
bar dıkım manditiya xwe
Ne vebûna gulek dı singê mın da
Ne ji ewrên çavên mın
ez tırsandım
Lêxıst zınyar lı porên mın
Gırt û bır gewdê mın bayê êvarê
Û azadi tem kırın awırên mın
Dı çiyên wi da
Dı mêrg û çemên wi da
Çı xweş wê bıbe jiyan
Wê çı xweş zil bıde evina mın
Dı axa wi da

Bı dest hatiye neqış kırın bıharê wi
Bıhara bı xwin
tov
û jiyan
Dı asoyê wi da roj heltê
roj dıçe avan
İnsan dıji û dımre
Roj jiyan e, mırın e tari
Azadi ye agır, mırın e bêdengi
Lê ez helhatına rojê çı bıkım
Heta ku ewr neqelışine û negê mın
Lê ez jiyan çı bıkım
Heta ku azad nebın ramanên mın

Lı ser mılên xwe
Ezê disa bar kım manditiya xwe
Ne tenê şevek
lê bı dırêjahiya temenek
Stêran disa bar kım
lı ser mılên xwe
Heta ku azadi nekışe ber esman
Ezê vekım singê xwe hatına gulan.

1993

## *Bı çı kêr tê şıêrek bê qûdret*

Zınaran dıterışand pêlên kor
Dema ku zengıl sıhêti dıkır zeman
İsa dınaliya dı çarmıx da
Çavên mın da hêvi te dıgeriyam
Û te seh dıkırım
Goyên mın da qirina bêdengiyê
Zınaran dıterışand pêlên kor

Vê rê mina terışandına zınaran e
Vê rê sebr, rık û cehd dıxwaze

Û dılê ku bı hesret hatiye dax kırın
Lı tarixê neqış bûye rabırdûya te
Û çavên dostê ku dıgirin
Lı çiyan hatiye çandın. diroka te

Û bı çı kêr tê şıêrek bê qûdreta çek
Tenekeyên vala ku qezibêji dıkın
Bı çı kêr tê herıkandına çemek lı boşê
Esmanek bêroj
Û çavên dilê ku bê isyan ın

Vê rê mina terışandına zınaran e
Vê rê sebr, rık û cehd dıxwaze.

1993

## *Kulilka azadiyê*

Welatê destanan e
Bındestê dirokê ye
Lı cemedê axa wi germ
çemên wi kef gırtıne
Jı ber çı ye nayê zanin lê
Pelên wi tımi lı bıharê çılmısine
Çavkaniya Mem û Zin a Ehmedê Xani ye
Warê jivana evindaran
weki Siyabend û Xecê ye
Du keziyên xwe berdaye
lı ser singê Mezra Botan
Tenê xwastiye gul belbın
lı ciyê ziwan û sıncan

Lı esmanê Venus e
hûriya delaliyê
Ew e lı ser erd
kulilka azadiyê
Dı çem da masi ye
teyr e lı esman
Tirêja rojê ye
jı şûr ra qalan
Ew e kaniya şıêr
neqışa dıla
Ew e hevrêya kevok
neyarê gura
Jı hevrişım fırfırok
hêvi çêkır jı pola
Lûvinek bêdawi ye
Bayê zırav, ava zelal
jı kalan mirasê hêja
Welatê mın
Kurdıstan.

## *Gulıstan*

Navê te gotın, Gulıstan e
Ê mın
Nızanıbi ji dıbe
Dıxwazi em jı te xeberdın
Dengê te, rengê te me gelek bıhist
Dıbên
Bı ro roj, bı şev ji hiv i
Jı çavan ra roni, dılan ra derman i
Bı hezaran ken lı dora xwe dıpêçi
Dı bexçan da xezal, dı çiyan da kewmari yi
Ez
Dev jı mın berdın nıha
Ev helbest jı bo te ye, ne jı bo mın
Û em jı te xeberdın

Gulıstan
Evinıka dıla
Nızanım çawa dest pêkım
Awırên te, awırên mın ketıbû ew ro
Roj dıbırıqiya
Brûskek xerib jı dılê mın derbas bû çû
Mın mêze kır kaniya te ya zelal şêlû bû
Û ewrên reş û tari xûya bûn
Jı bo ku bıbinım
Ew çı êş bû şêlû dıkır kaniya te
Mın xwe berda lı kûrahiya çavên te

Sanki ketıbûm alemek dın
Dınyayek nıp û nû
Bihna azadiyê dıhat jı kulilkan
Bihna hêvi û evinê
Kevokên spi lı ser çekên şıkesti dıfıriyan
Lê mın zû fehm kır
Ku ev dınya, ya te bû Gulıstan
Tenê ya te
Ne jı mın ra
Ne ji jı yeki dın ra cih tunebû

Hêdi hêdi baran dest pêkır
Hınık şunda behrek mezın çêbû
Hundırê te da ew çend bedewi
Ewqas jiyan û hêvi
Lê mıxabın dıl ji carek şıkesti
Behr ji din bıbû êdi
Ez gelek ber xwe dam
Lê çı feyde!
Pêl bı pêl hate ser mın
Û ez avêtım derva
Gulıstan, tu dıgriyayi...

Ez
Çawa bêjım
Dınya mın ji wek ya te ye
Carna behra mın ji din dıbe
Lê çaxa ku hêsıran şer vedıkın çavan
Ez çavên xwe dıgırım
û dınya xwe xeyal dıkım
Dev jı mın berdın dıxwazi
Ev helbest jı bo te ye, ne jı bo mın
Û em jı te xeber dın

Nızanım çawa dest pêkım
Awırên te, awırên mın ketıbû ew ro
Roj dıbırıqiya
Brûskek xerib jı dılê mın derbas bû çû...

1994

## *Gulle û mırov*

Çıka vê gulleyê har û din bınêre
Lı serê lûla tıfıngê tetık daye
Çav lı der û dora xwe dıgerine
Bê guman dıxwaze mal xerav ke
Evinan bışkêne
Bırçiyê tenek spi ye

Lê heval, sûcê gulle çı heye?
Ew perçeyek hesın e
Jı evin û jiyanê çı fehm dıke
Ewê ku tetık dıkışine
Ewê ku mal û eşqan dışewıtine
Berhemên mırov ın gullan
Mırov bı xwe ye dıjmınê jiyan.

1994

## *Evina mın a yekem*

İro dıxwazım cardın te nas kım
Te bihn kım, te tem kım
Em jı hev zû qetiyan, ne usa?
Bı rasti
Dı xeribiyê da mın fehm kır
Evina xwe jı bo te
Bı salan
Dı çavên xwe da tenêtiyek mın his kır
Mın cehd kır, jı bo ku tıji kım vi cihê vala
Lê çav negıhiştın evina xwe
Dest bışkên, negıhiştın destên te

Bawer ke
Eger nıha Mırın jı deriyê
Ù Jı mın ra bêje ku:
Hevalo, saetek jiyana te maye
Bızanıbe ku ew saetekedawi jı te ra ye
Bê guman jı te ra
Ma jı evin bedew tırin çı heye?
Evina mın jı bê emsal e
Bê sinor û bê mırın e
Ezê çavên xwe bıgırım û xeyal kım
Tem kım û bihn kım te, Diyarbekir
Heta ku mırın jı hev ve qetine
Mın û te.

1994

## *Ezê rojê şiyar kım*

Ezê rojê şiyar kım
Hêdi hêdi
Sebır ke hınık
Hê bihna xweydanê tê jı axa westiyayi
Bedewiya kulilkan bınhêr
Bayê êvarê stıranan bar kıriye tê
Bı çavên xwe tem ke çıka
Hın caran şev ji şirin e
Tovê reş wê bıteqe
hım lı erd
hım lı esman
Her tışt dı wexta xwe da bı kêr tê
Sebır ke tu

Ezê rojê şiyar kım
Hêdi hêdi
Sebır ke hınık
Ev çı mıj e heval, çav çavan nabinê
Dans dıkın gur û karık
Çiyan ketıne hevûdu
Mıjûl dıbın mar û mışk
Û serihıldaye dûpışk
Jiyan tıji bı kontrast e dıbini
Lı şevaqê dost dıbê
dıjmın dıbe lı êvarê
Û her tışt dı wexta xwe da bı kêr tê
Sebır ke tu

Ezê rojê şiyar kım
Hêdi hêdi
Sebır ke hınık
Çırûskek pıçûk qim dıke
jı bo ku esman bıqelışe
Mırovan bınhêr
Mina mêşên ku dıkevın roniyê
Ketın kulina xwe
Fanosek besi wan e
Heta ku çavên wan bırçi nemine
Û wa ye jı kûrahiya bêdengiyê
lûvinek e dıkışe tê...
De megri esman, megri
Dıjmınê mın ne tu yi
Ez jı te ji hez dıkım bızanıbe
Ewê ku çavên mın sêwi dıhêle
Ewê ku roniya mın vedışêre
Ne tu yi, megri
Bawer ke bı roj ra
wê hesırên te ji wında bın

Ew ki ye jı te ra keskesorê tine ?
Ew ki ye rûyê te jı ewran. paqıj dıke ?
Ezê rojê şiyar kım
Dı çavên mın da behr û çiyan heliyan
Dı zımanê mın da kılam qediyan
Ezê rojê şiyar kım
Hûriyên mırınê mal bı mal dıgerın
Sebra mın ji nema
Sebır ke tu .

1994

## *Têlefon*

Berf bariye
Çarali çilspi
Êzıng dı sobê da pêdıkeve
bı gurme gurm
Jı nışkava
Qirina têlefonê lı odê deng veda
Têlê wi dı destê mın da
cemıdi ma
Hundır pêçand bı bêdengi
Xebara ku jı dûr dıhat
Nıha ode jı derva ji sartır
Û xwin dı dıl da
sekıni ma
Çı dıxwazi jı me lo mırıno!.
Dı vê saeta şevê da .

21 Sıbat 1994

## *Keçıka kejal - 1*

Carcaran te dıfıkırım
Tenêtiya xwe
Stêrên ku manditiya şevê bar dıkın
Pelên çılmısi yên payizê
Befrina ku axa germ dıxurine
Dı ava bıharê da venebûna kulilkan
Mana demsalan dıfıkırım
Carcaran
Dapıtandına guliyên cıwan
Dı şevereşê da bırıqandına çavan
Hebên baranê ku bûne dilê ewran
Ew hebên ku
Bı hezaran hêvi bar dıkın jı esman
Dıkene ax
Dıkenın çıvik, kulilk û mırovan
Mana jiyanê dıfıkırım

Carcaran
Dı vi emri da, zarûkatiya xwe
Perçe perçe...
Êdi ne darên gûzê mane
Ne zarûyên rûken
Ne yek gulek maye, ne ji mêşên zirek
Çar pare bûye rabırdûya mın
Ber bı bêdengiyê koç kıriye jiyan
Jı ew gêleyên jêhati ji qet hes tune
Û ew xaniyê pıçûçık ji şewıtandıne
Ka bı hatına leglegan em dıçûn
Ka çıvik dadan pencera wi
Ka ew xaniyê pıçûçık hebû ya !..

Çiyan ji bê xwedi, şılf û tazi
Dı bın ewran da rıp û reş dıkın
ew çiyayên delal û kal
Her tışt ari kıriye xışokê şemar
Tımi dılan çar pare
ew fotografên zerbûyi ji
Lê tıştek bir kıriye xışok
Xiret hê rıp û rast ser piya ye
Mana insaniyetiyê dıfıkırım

Carcaran
Me herdûyan
Evina me ya şıkesti
Tu lı aliki ... Ez lı aliki
Gotına wê zor e lê
Eşqa me mina ya şev û roj e
Tıştek fena behr û esman
Û qet jı bira mın naçe
Ew şin heye ya, ew şin!.
Ew şina behrê
Ew şina ax û esmanê
Û ew keçıka kejal
Ew, bı rûyê sorıng
Ew, bı destê tenûr
Ew dılê ku dılê mın germ dıke
Ew, azadiyê hez dıke û dıde hez kırın
yani jiyan bı xwe
Ew keçıka kejal hebû ya !.
Te jı bir va kır ?

Ka bı hezaran gul vedıkır kenê wê
Ka dıket nav pelên lerızi
mina germahiya dılê dayıkan
Ka ew mırovan hebûn ya!
Kurtekê wan bı tenê wan va zelıqi
Mırovên ku sıwarê trena êvarê dıbûn
û rewiyê ewran bûn
Tımi lı benda wê dıman
Nızanım lı ku ye, çı dıke nıha?
Salan e nevegeriya van dera
Dıbe ku xeyidiye jı me
yan ji me jı bir kıriye
Çend sal berê
Terk dabû dayıka mın ber destê ewran...
Çaxa ku berf dıbare
bı bahozê ra tenê, bı serê xwe
Çaxa ku pelek çılmısi
yan ji insanek ku dılerıze bıbinım
Û her şeva ku tenêtiya mın dımêje
Te dıfıkırım keçıka kejal

Carcaran
Dayıka xwe û hêsırên wê
Ew hêsırên ku dılop ... dılop dıbarın
Bêje jı mın ra dayê
Jı ber çı ewqas sor ın hêsırên te ?
Her dı kılam û helbestan da dıji tu
Ewrên reş kêm nabın, jı ser rûyê te
Lê kenên xweşık dıxwazım ez dayê
ne hêsıran
Lê ez te dıxwazım dayê
ne xışokan
Lı ser singê dayıka xwe
duwerojek dılgeş û azad dıfıkırım
Carcaran ...

1994

## *Jı dê bûn lı vi erdi*

Çaxa ku Dicle hate dınê
Feradê nas ne dıkır
Ferad ji Diclê
Yeki bûk yeki zava
Jı hevûdu bêhay
derdıkevın rêya
Çiyan bı zımrûdê neqış dıkırın
Evin dajotın
Carna ji
dıçıniyan dı rê da
Yeki bûk yeki zava
Çavkani dı hembêza dayık da
Lê lı xurbetê qısmet dıbe
lı hev hatın jı wan ra
Bı avaki dın e disa ji
Jı dê bûn lı vi erdi

Evina mın demsali ye, dızani ?
Jı dê bûm lı vi erdi, nızanım fehm dıki ?
Bê hesti ye zıman, nasekıne
Û dılê mın dı qefes da, nızanım seh dıki ?

Hım mırın e, hım jiyan
Hım rondık e, hım kulilkek ku aj dıde
Jiyan bı xwe şerek e
behr
esman
û ax
Hım ewr e, hım baran
Jı dê bûn lı vi erdi

Çaxa ku Dicle hate dınê
Feradê nas ne dıkır
Ferad ji Diclê
Yeki bûk yeki zava
Ki bawer dıkır ku lı hev batan
Dicle û Ferad
Rasti ji macerayek bê tıxûb e
Jı dê bûn lı vi erdi

Evina mın demsali ye, dızani ?
Jı dê bûm lı vi erdi, nızanım fehm dıki ?
Bê hesti ye zıman, nasekıne
Û dılê mın dı qefes da, nızanım seh dıki ?

1994

## *Tenê kenê te ma*

Ka te gotıbû tuyê bê
Heta berbangê hiviya te sekınim
Jı ber ku te gotıbû tuyê bê
Lê tu nehati
Ka te soz dabû
Jı bo careke dawi
çavên mın çavên te
Mınê tu bıdiyayi ...
Lê tu nehati

Mıja êvarê
Mıja ku tariyê roni dıke
wek xeyala te
Ew tariya xınzir
ku rûyê wê ne xuya ye
Her tışt gote jı mın ra
Jı bo çı tu nehati
Jı ber çı mın tu nediti
jı bo careke dawi

Her tışt gote jı mın ra
Cihê te ji ew nışani mın da
Vi kevırê spi
Vi kevirê ber serê te
Bı kenê te neqış bûye
Ew kenê ku
diyari ma jı me ra
Tenê ew kenê te

Hiviya te sekinım ew ro
Te soz dabû tuyê bıhatayi
Lê nehışt ew êvara reş
Heps kıre te
lı kûrahiya tariyê xwe
Û lı pışt kenê te ma tenê
roniya şevereşê
Kenê te.

1994

## *Çawa gılî kım heval*

Çawa gılî kım heval
Lı rojekê sıbatê
Bedewiya esmaneki şin
Bı hezaran stêrên rengin

Çawa gılî kım bıvê
Wa hezaran sal e
Xwina ku dınısıle
Jı dılekê bêzar û xemgin.

1995

## *Bı te ra me ez bıra*

Bı şev û bı roj
Bı hêvi yan bê hêvi
Bı te ra me ez bıra
Dıxwazi
Pırs bıke jı kulilkên cûre cûre
Jı zınarên bılınd an jı kevırên pıçûçık
Jı berf û baran
Jı çar demsalan
                    jı roj an jı stêran
Dıxwazi
Jı bayê nerm ku çiyan dıluvine
Jı çavkaniya avê ku mina dılê zarûkan e
Jı teyr û kewan
                    jı xezal û pezkûviyan
Jı dılê xwe pırs bıke, dıxwazi
Bı dıl û can
Bı te ra me ez bıra.

1995

## *Ew ro,*
## *roj helnahatıbû lı bajarê Helepçê*

Ew ro
Her tışt bı awaki dın bû lı bajarê Helepçê
Ew ro
Sermayeki nediti lefandıbû kûçe û kolanan
Ew ro
Esman rıp û reş bıbû jı şerm û bê çareti
Ew ro
Navê xwe guhartıbû Mırın û kırıbû Helepçe

Hınık dı leyistınê da bûn
Hınık dı kêleka çemê da
Hınık ji keriyên xwe dıçêrandın
Û nû hatıbû dınê, bırayê bênav
dev dı pêsira dayık da
Hatın qefaltın bı xınziri
Jı mırına qelleş ra

Dengê balafıran ket nav yê qirinan
Û êdi dıgeriya mıja jehrin
lı nav bajarê Kurdan
Mal bı mal, kûçe bı kûçe
Mehla jorin û ya jêrin
*-Ha, tışteki lıvıti dı bın vi kevıri da*
Gêle û pırpırk, kevok û mêxık
Heta mar û dûpışk
*-Ha, hê bı rûh* e *vê kulilka*
Hêdi hêdi
Xwe lefand mina tûleki sıpi
Lı çaraliyê Helepçê

Roni vemırî dı çavan da
Û şevekê sexte lı derva
Lı erd, bav û dayıkan
Dı rûyê wan da keneki bêdawi
Û dı hımêza wan da zarû vedızeliyan
Ka bıhar hatıbû, wê kulilk vebûna
Çıma çılmısi û weşiya pênc hezar can ?

Ew ro
Payiz derbas bıbû jı bajarê Helepçê
Ew ro
Sermayeki nediti lefandıbû kûçe û kolanan
Ew ro
Esman rıp û reş bıbû jı şerm û bê çareti
Ew ro
Roj helnahatıbû lı bajarê Kurdan, lı Helepçê.

1995

## *Jı hesretê perıtim*

Axx!.. Jı hesretê perıtim
Perıtim jı tina
Axa zıwa me, lo lo hevalo
Çavên mın sêwi man
çavên mın dı sırgûn da

Baran şadê mın e
Ew kevırên reş ên terışandi
Paris şadê min e, lo hevalo
Pır geriyam portreyeki welatê xwe
Pır geriyam kevokên bı bask şıkesti
Çavên bırçiyê roni, gulekê çılmısi
Û dûyên şewatê
Gav bı gav
Lı hêviyê geriyam, lo hevalo

Lê dest bo bedewiyan dıxebıtın
Dıl çıqas ji tenê bın
Çıqas ji bihn nedın kulilkan
Bı dest tên çêkırın wêneyan
Bı dest tên nıvisandın piyesên têatroyan
Û hêsır ne baran e lı van dera, lo hevalo

Pır geriyam portreyeki
Pır geriyam cihek ku bı bir bine welatê mın
Lê Mûnzûr û Dicle derbas nabın
Derbas nabe Mûrad jı van dera
Û Seine nabe Feradê me
Alpes û Pyrenées nabın
Cûdi û Ararat
Jı çaraliyê dınyayê tên
Bo ditına Tour Eiffel û Champs Ellysées
Mûza Louvrê yan ji qesra Versaillesê
Gotın hewce nake lı ser bedewiya wan
Lê bı awaki dın ın
Çiyayê Nemrûd û bedenên Amedê
Hesenkêf an ji seyra gola Wanê
Pır geriyam portreyeki welatê xwe, lo hevalo
Lê Franse tucar nabe Kurdıstan

Axx !.. Jı hesretê perıtim
Perıtim jı tina
Axa zıwa me, lo lo hevalo
Çavên mın sêwi man
çavên mın dı sırgûn da .

1995

## *Çengek av*

Çengek av dıxwazım
Esmanê dıxwazım dı çengên xwe da
Roj û tımi stêran dıxwazım
Rûyê mın veneşêre
Çavên mın nedıze jı mın
Xuhdan dıxwaze tov lı axa çıkiyayi
Jı xwe bo çı davêje vi dılê fani
Delaliyê veneşêre jı mın

Çaxa ku xençer tê xıstın pışt çiyan
Çaxa ku xwin belav dıbe lı esman
Çengek av dıxwazım
Kulilkên ku dıkenın
Darıstanek ku dans dıke bı bahoz ra
Behran veneşêre jı mın
Nerûçıqine baskên mın
Têlên tembûrê bı qireqir ın
Kılam dı qırık da dıqedın
Evin merxasi dıxwaze
Jı xwe tenê mırın bê mırın nine
Bextewariyê veneşêre jı mın

Ku şerê te ji bo bedewiyan be
Ku tu ji dıji serdestiya tariyê bi
Xwe veneşêre usa ye jı mın
Roniya mın nedıze
Nedıze tovên hêviyê
Dest bo hevgırtınê ne
bıgre destên mın

Çavên mın westiyan jı barkırına ewran
Westiya dılê mın
Jı barkırına xemginiya çendın dewran
Ya destên mın
Westiyan jı vala man destên mın
Çavên mın
dılê mın
û destên mın
Westiyayi lê weki xwe tenê ew man
Veneşêre nirên zıncari
Kenên ku dışewıtın
Derewan û derewinan veneşêre jı mın
Ka bo çı zil avêt nefret dı dıl da
Hım ji dı kêleka evin da

Bo ku Spartakus bın çiyan
Bo ku xiret bê gırtın bı destan
Çengek av dıxwazım
Tımi stêran dıxwazım
Bo ku serbılınd be duweroj
Bo ku pel neweşın lı nûroj
Çend gotınên xweş dıxwazım
Û çavên xwe veneşêre jı çavên mın
Rûyê xwe nerevine jı rûyê mın
Gulıstan tıji gul e
Were em bı hev ra kom kın
Destên te dı destên xwe da dıxwazım

Çengek av
Çengek av dıxwazım jı esman
Esmanê dıxwazım dı çengên xwe da
Roniya mın nedıze
Nedıze tovên hêviyê
Xuhdan dıxwaze tov lı axa çıkiyayi
Jı xwe bo çı davêje vi dılê fani
Mırınê veneşêre jı mın .

1995

## *Ku roj heltê*

Bı destên benevşi
Pê verımine dı nav solên qelaşti
Çav bar dıkın hezaran şev
çav westiyayi
Dı mıl da hêvi
Û lı ser lêvan e kılama neqedandi
Evina azadiyê gırtiye ciyê agırê
Tenê germahiya dılan e
Ku dıheline cemeda zıvıstanê

Ku roj heltê
Ku kulilk radıbın jı xewa şevê
Çavkani ranezane
Xwe gıhandıne ji ava robarê

Bo ku serê me bılınd be
weke çiyayê Ararat
Bo ku şerm nekın jı me
Mûnzûr û Ferad
Bıla sor be av
Mina esmanê berê sıbê
Bıla sor be axa delal
Ku serbesti aj bıde jiyan lı bıharê
Ma Ronahi ji şer nake lı hember Tariyê
Ma lı dawiya fılmê
esman ji sor nabe
Berê ku Roj bıgêhe azadi

Ku roj heltê
Ku kulilk radıbın jı xewa şevê
Çavkani ranezane
Xwe gıhandıne ji ava robarê.

1995

## *Keçıka kejal - 2*

Dıbên vegeriyaye
Keçıka pênc mılyar sali
Û tımi bedewiyan
dı kenê wê da veşarti
Bıhar û şinayi
hêvi û azadi
Disa usa çavtêr
Û porên xwe yên zer berdaye
lı ser singên tazi
Hay jı me heye nıza'm
keçıka pênc mılyar sali.

1995

## *Kulilk û mırov*

Kulilka bedew
Dı guliyê xwe da
Bı bejn û bala xwe va
Çı rınd û dılgeş bû
Dı destê mırov da
Çılmısi çû .

1995

## *Gulekê jı dest dûr*

Dıxwazım gulekê bajom
Lı ser vi gırê dûr
Usa ku
Bıla dı kılaman da neyê gotın
Bıla pelên wê neweşın
Gulekê jı dest dûr.

1995

## *Roj*

Bı roj ra vedıkın em
çavên xwe lı dınê
Lı tariyê dıgırın
Û icar xeyal dıkın rojê .

1995

## *Bori û iro*

Dı bori da dıgeriyam
Rasti gelek nasan hatım
Yên çûyi û yên mayi
Jı nışkava
Çavên mın rasti çavên mın ên pıçûk hatın
Mın lı fotografê
Fotograf lı mın dınêrt
Dı nêrina mın da
                    ne xem hebû ne xeyal
Zıvırim
Cardın çavên mın rastî xwe hatın
Mın lı aynê
Ayne lı mın dınêrt
Dı nêrina mın da
                    hım xem hebû hım xeyal

Dı bori da dıgeriyam
Rasti xwe hatım
Ew dı bori da mabû
Ez ji iro bûm .

1995

## *Huner û insan*

Huner insan e
Fırçeyê dıstine nav tıliyên xwe
Bê mırın dıbe dimenek
Ku iro heye sıbê tune

Huner insan e
Pênûsê dıstinê nav tıliyên xwe
Mal bı mal dıgere
Hêvi bar dıke, carna xem û xeyalan
Bı dırêjahiya temenek

Huner insan e
Penayê dıstine nav tıliyên xwe
Evin pêdıkeve lı têlên tembûrê
Ew têlên ku
Bı hezaran evin bar dıkın lı geliyên dûr
Ba û bahoz û baran
Dılên pola dıheline

Huner insan e
Beethoven e, Cıgerxwin e
Ku xwin dıdın jı temarên zıwa ra .

1996

## *Wênevan*

Lo lo wênevano
Wêneya welatê mın ji çênaki ?
Berê ku ba û bahoz rabe
Berê ku kesk reş, şin sor be

Lo lo wênevano
Wêneya welatê mın ji çênaki ?
Bıla pey baranê be
Bıla têda Keçıka Kejal ji hebe
Çiyayê Ararat, Dicle û Ferad
Bê wan jı xwe wêne nabe
Ku bıkarıbi jı kulilkan keskesorê çêke
Ku bıkarıbi jı baskên kevokan aşıtiyê bınıvise
Çend xani ji hebın bıla
Lê jı pacayan ji rabın dûmanan naxwazım, ha !..
Kurd ji rûken bın bıla
Ku hêysır ji hebın bıla yên şahiyê bın
Tu tıştê ku şer û mırınê bine bı bir naxwazım, ha !..

Def û zırne ji hebın
Lı serê govêndê ji tu
Ez ji şıvan bım bıla
Û dı bılûra mın da kılama azadiyê
Ku te wêneyê qedand
Têke nav çarçoveyê
Ku tu kes destên xwe dırêj neke êdi

Lo lo wênevano
Wêneya welatê mın ji çênaki ?
Berê ku ba û bahoz rabe
Berê ku kesk reş, şin sor be .

1996

## *Lı çiyayên welatê mın - 1*

Roj bı awaki dın heltê
Bı awaki dın dıçe avan
Bı rengeki dın dıbare baran
Û qedexe ye rengê keskan
Lı çiyayên welatê mın

Gul her têne dapıtandın
Guliyên wan bırindar ın
Her dem jı wan xwin dıbarın
Derman disa lı çiyan ın
Lı çiyayên welatê mın

Xwin û xweydan dı nav hev da
Westan tune, nayê bira
Stêr her çax dı mılan da
Kurd azad ın tenê lı wa
Lı çiyayên welatê mın

Bakûr Başûr Rojhelat ın
Mûnzûr Dicle û Ferad ın
Amed Hewlêr Mehebad ın
Tev pêşmergeyên welat ın
Lı çiyayên welatê mın

Tov dıteqın jı bın xweliyan
Çav zor dane lı bıjangan
Zehf bûha ne dem û zeman
Jiyan tune bê berxwedan
Lı çiyayên welatê mın .

1996

## *Lı çiyayên welatê mın - 2*

Roj dıheliya
Hım ji dı agırê xwe da
Çal bû lı kûrahiya deryayê
Tari serketıbû êdi

Dıl dıheliya
Hım ji bı evina xwe va
Çal bû dı nav hêsıran da
Rık û nefret serketıbûn êdi

Mırovahi dıheliya
Lı çiyayên welatê mın
Hım ji bı destên mırovan va
Tıştek ku serbıketa nemabû êdi.

1996

## *Helbest û jiyan*

Dı helbestan da xwedi dıkım roja ku helbê
Pêl bırçi ji bın lı zınaran
Çav ji bırçiyê hêsıran
Dı helbestan da dıneqışinım bedewiyê
Germiya destên bı cewr
Nermiya kevırên çendın dewr
Û mina kurmê hevrişım
ku dıguhure dıbe pırpırk
Dı helbestan da dırêsım baskên mırovan
Ku jı dilitiyê ber bı azadiyê va dıfırın.

1996

## *Dıl û xwin û pênûs*
## *û lı ser hevrêtiya me*

Bı şev lı wexta razanê
Bı qimek roni an bê roni
Yan ji bı bayê êvarê ra bar kıri
Guhdari dıkım bı hezaran dengbêjên xwezayi
Carna ji vedıcınıqım jı xewa gıran
Dı goyên mın da
                    tıngina nıgên mûriyên westiyayi
Û xwin dırıje dılop
                    bı
                    dılop
Jı dılê mın
Dınısıle jı temarên mın
Û dı pênûsa mın a rıkdar da dıbe kılam
Evina ku dışewıtine şevereşa xemgin

Geh lı behrê rêwi me
Geh dı rêya hesınan da
Geh êşa axa zıwa me
Geh gulek ım dı guliyê xwe da
Geh dınêri roj bûme lı nav xweliyê
Geh dınêri lı esman ım dı paşıla stêran da
Geh dınêri gulleyek rageş bûme
lı wır an lı vır
Geh dınêri pey hêvi me weki Mem
dı kaniya evin da

Ev e hevrêtiya mın û wan
Dıl û xwin û pênûs
Ku jiyan dıde helbest û stranan.

1996

## *Bori û duweroj*

Çı zor e hevalno
Ku dı vi emri da mırov
Beriya rabırdûya xwe bıke
Ew bori ku tenê
Dı xeyalan da dıxuye
Ku mina ayneya şıkesti
Perçên wê ne xuya ne

Lê disa ji xem nakım hevalno
Çıqa bışewıtın ji rojên paşeroj
Lı ser ariyên boriyê wê aj bıde duweroj.

1996

## *Êdi bes e - 1*

Lı zerbıharê, peleke çılmısi
Jı hal keti, westiyayi
Ber xwe dıda
Jı bo ku nekeve erdê
Dı bın piyan da nepelçıqe
Dest jı guliyê xwe
Dest jı demsala bori
Ber ne dıda

Êdi bes e
Ku mırın e bıla bedewtırin be
Ku jiyan e bıla heri bı rûmet

Lı zerbıharê, peleke çılmısi
Jı hal keti, westiyayi
Ber xwe dıda
Ne dıtewand penaberi
Dı bın siya dara xwe da
Dest jı mırıneke bedew
Dest jı jiyana bı xiret
Ber ne dıda

Lı zerbıharê, peleke çılmısi
Jı hal keti, westiyayi
Ber xwe dıda
Lê, rê gıhabû êdi dawi
Dı nav jiyan û mırınê da
Yek
An ji du nefesa mıroveki
Û ew
Dest jı hêviya bı cewr
Dest jı xuha çendın dewr
Ber ne dıda

Êdi bes e
Ku mırın e bıla bedewtırin be
Ku jiyan e bıla heri bı rûmet.

1996

## *Êdi bes e - 2*

Lı şevekê mıjsıpi
Bê xew
Bê xewn
Dı heşê mın da
Ew dimenên Çolemergê
Dimenên bêxweditiyê
Dı cihên qırokan da
Nanên xwe dıgeriyan
Bı wan destên pıçûçık
Ew dılıkên xas û paqıj
Tev zarokên welatê mın
Xwişkên mın
Bırayên mın

Dılê mın pırpıti
Û lı esmanê
Çend bırûskên demsali
Jı dûr dıhatın
Jı geleki dûr
Jı kûrahiyeki bêemsal
Xwe danin pencera mın
Çend dılopên kovanbar
Nısılin hêdi hêdi
Û her tışt derbeder bıbû êdi
Lı hundır û lı dervayê mın

Êdi bes e
Ku mırın e bıla bedewtırin be
Ku jiyan e bıla heri bı rûmet

Lı êvarekê demdereng
Dı heşê mın da
Neviyên Şêx Ubeydullah
Tev zarûkên welatê mın
Û çend dılopên serseri
Xwe danin pencera mın
Nızanım jı dıl dıhatın
an jı esman
Nızanım hêsır bûn
an baran.

1996

## *Jı bılûra Venus*

Lı şevekê westiyayi û kovanbar
Çemek e dıxuşxuşe
Bar dıke hêsırên çiyan
Û jı kûrahiya bêdengiyê
Nısıli straneke nebihisti
Kılameke xemgin
Melodiyeke pejare
Ku dıl dıkır hezar pare
Dı baskên bê da
Dıgerand çar demsalan
Jan û kulên stêran
Xwe lı ku dani nıza' m
Hevalê ku şeqıti jı nav wan

Ez
Lı çiyayên welatê xwe
Lı geliyê Zilanê
Lı ser sûka Mehebadê
Lı bajarê Helepçê
Û ew dûyên bêeman
Ku radıbın jı gundan
Ku dı tembûra Şıvên da
Tev bûne stran
Dıgerım êş û keserên Kurdan .

1996

## *Feradê din*

Dengeki tê jı dûr
                jı geleki kûr
Jı pışt pıran û çiyan
Jı pışt rez û zeviyan
Ne bılûra şıvanek e
Ne harbûna esmanê ye
Dengeki tê jı dûr
                jı geleki kûr

Disa bı gurme gurm e
wa ye tê
Berf û baran hıldaye
wa ye tê
Ketiye pey evina xwe
Ev e wıha har û din e
Zavayê welatê mın
wa ye tê

Destanek e ew
Ku dırêj dıbe jı Bakûr
Hetani lı Başûr
Jiyan dıde lı axa
seranserê welatê mın
Ku jı hınka ra bûye nav
Kılam jı hınka ra
Nav daye dıbên din e
Ferad e ew
Feradê din.

1996

## *Gundê mın*

Dema ku dest pêdıke
valsa roj û ewran
Dema ku berf xwe dıgıhine
çem û robaran
Dema ku şên dıbe
bayê êvarê lı çiyan
Tu tê bira mın
Evina mın

Çend sal bû
Çend demsal bıhûri, nızanım
Tev koç kırıne dıbên
Tûr û mûran
Hechecıkan...
Tê bira mın
Cara dawi
Xaniyek çêkırıbû me
Jı qûmê coyê
Nızanım hê lı wê ye...

Dema ku baran
hûr hûr tête jı esman
Dema ku bihna xakê
dıkeve nav a kulilkan
Dema ku viçe viça çûkan
dertê jı hêlinan
Tu tê bira mın
Gundê mın.

1996

## *Hêvi*

Xeyal tuneba hêvi ji nedıbû
Hêvi ku banga duwerojê
Wêneya jiyanê ye
Bı destê mırovan tê rêsın
Û bı destê wan dıgê dawi
Haveyna xwe berxwedan e
Efû nake tucar pênûsên vıngivala
Her dem xebatê dıxwaze.

1996

## *Jı çı dıtırsi*

Mın jı gul pırsi
Jı çı dıtırsi ?
Got jı meqesê dest mırovan
Mın jı kevok pırsi
Jı çı dıtırsi ?
Got jı tıliyê ser tetıkan
Mın jı gêle pırsi
Jı çı dıtırsi ?
Got jı bın piyê mırovan
Mın jı kew, jı xezalan
Jı ax û dar û robaran
Jı roj û hiv û stêran pırsi
Tev gotın jı mırovan

Mın jı mırov pırsi
Tu jı çı dıtırsi ?
Got jı xwe û jı çavreşiya mırovan.

1996

## *Çavên hozanê*

Herdu çavên hozanê
Yek lı ali xwezayê va zıvırandi
Yek ji dışopine rêya mırovahiyê

Xızna hozanê ye
Zanin, ramandın û xeyal kırın
Fekiyên xwe jı xwezayê
Nêrinên xwe jı mırovan kom dıke .

1996

## *Kulilka Spartakus*

Dema ku roj çel dıbe lı asoyê
Jin dıbe lı çiyan bayê êvarê
Dema ku baran dıpeline bılûra şıvan
Dest dırêj dıke berbang lı çavan

Ber bê kete pel, ber bê kete xak
Teqiya tovê reş, fışıqi şefeq
Hêdi hêdi vekêşiyan nir û zınciran
Heliya cemed, leyistın masiyan

Û belbûn kulilkên Spartakus
Lı çar dorên welatê mın
Keda eşq û sebr û berxwedan
Mıl bı mıl bûn, dıl bı dıl bûn
Aşıti hatıbû, çı xweş bû jiyan.

1996

## *Palyaço*

Ew anonim
Rûyê wan jı keskesorê
Tepişkori karê wan e
Armanca wan
Dılgeşiya dılan
Çırûskandına çavan e
Lê palyaçoyan ji dem tê
Dıgirin û girinê tinın hın caran.

1996

## *Dengê mırınê*

Pêl deng vedan lı zınaran
Lı asmên şemateya ewran
Roj sar bû
Dû rabûn jı pacayan
Jı çiyan bı rê ketıbû şeva çûyi
Kılama bêreng, dengê mırınê
Û pel bı pel weşiya havin lı mêrgan
Ew helgırt û bır bayê êvarê
Û ez mina wan pelên çılmısi me
De were mın ji helgıre
Heyy kılama bayê !..

Pêl deng vedan lı zınaran
Lı asmên şemateya ewran
Roj sar bû
Bı kef û kopırık bûn çem û robaran
Şeva ku jı hev vedıqetand du demsal
Ber bê ketın û çûn delaliya rengan.

1996

## *Daxwaz û rasti*

Lı şevan
Tiriya çayeki bı dem dıgerın çavên mın
Bo ku şev bıbe şev
Lê belê stêran ji hez dıkım
Xalên lı rûka delalekê tinın bira mın.
Ku jı demsal bı demsal zêde dıbın

Bo ku bı navê xwe bı bir binın royê
Esmaneki şıp û şin dıgerın çavên mın
Dı orte wi da çıraya ku roni dıke şevereşê
Lê belê ewran ji hez dıkım
Bextewariya xweza û mırovan dıfıkırım çımki
Axa ku lêvên wê dıderızın jı rojê.

1996

## *Şıêrên cıwaniyê*

Şıêrên mın
Demên cıwaniyê ne
Ku çar demsal dı rojekê da dıxuye
Geh ba û baran e
Geh roj dıbırıqe
Geh berf û cemed
Geh bıhara rengin e

Şıêrên mın
Demên cıwaniyê ne
Keskesorê dılan ın
Carcaran dı kêleka evin da
Aj dıdın nefret û kin
Carcaran bı hêrs û bı qirin
Behreki din, esmaneki har dıbın
Lê her tım lı dawiyê hêviyê dıçırısın

Şıêrên mın
Demên cıwaniyê ne
Ku bê westan rastiya xwe dıgerın
Car heye şer, car heye aşıti
Car heye roj, car heye tari
Dı nav jiyan û mırınê da dıçın û tên
Hın caran his pêşkevın ji
Tucar bernadın rêya aqlê

Şıêrên mın
Demên cıwaniyê ne
Ku çar demsal dı rojekê da dıxuye
Keskesorê dılan ın
Ku bê westan rastiya xwe dıgerın
Bê tırs ın şıêrên mın
Bo ku ew bı xwe ji cıwan ın .

Çıleyê Pêşin 1996

| Têdayi | Rûpel |
|---|---|


1 - Welatê mın 5
2 - Xeyal 6
3 - Gulek ım ez 7
4 - Yarek mın hez kır lı esman 8
5 - Hesret mam 9
6 - Darek ım dı nava çolê da 10
7 - Çavên mın bırçi 11
8 - Rêwi 12
10 - Oy dayê 13
11 - Teyroka me 14
12 - Evina qedexe 17
13 - Gula sor 19
14 - Jı te hez dıkım 20
15 - Bı dırêjahiya temenek 21
16 - Bı çı kêr tê şıêrek bê qûdret 23
17 - Kulilka azadiyê 25
18 - Gulıstan 27
19 - Gulle û mırov 30
20 - Evina mın a yekem 31
21 - Ezê rojê şiyar kım 33
22 - Têlefon 37
23 - Keçıka kejal - 1 38
24 - Jı dê bûn lı vi erdi 43
25 - Tenê kenê te ma 45
26 - Çawa gıli kım heval 47
27 - Bı te ra me ez bıra 48
28 - Ew ro, roj helnehatıbû lı bajarê Helepçê 49
29 - Jı hesretê perıtim 51
30 - Çengek av 54

31- Ku roj heltê 58
32- Keçıka kejal - 2 60
33- Kulilk û mırov 61
34- Gulekê jı dest dûr 62
35- Roj 63
36- Bori û iro 64
37- Huner û insan 65
38- Wênevan 67
39- Lı çiyayên welatê mın - 1 69
40- Lı çiyayên welatê mın - 2 71
41- Helbest û jiyan 72
42- Dıl û xwin û pênûs
û lı ser hevrêtiya me 73
43- Bori û duweroj 75
44- Êdi bes e - 1 76
45- Êdi bes e - 2 78
46- Jı bılûra Venus 80
47- Feradê din 82
48- Gundê mın 84
49- Hêvi 86
50- Jı çı dıtırsi 87
51- Çavên hozanê 88
52- Kulilka Spartakus 89
53- Palyaço 90
54- Dengê mırınê 91
55- Daxwaz û rasti 92
56- Evin 93
57- Şıêrên cıwaniyê 94

...

Çend sal bû
Çend demsal bıhûri, nızanım
Tev koç kırıne dıbên
Tûr û mûran
Hechecıkan...
Tê bira mın
Cara dawi
Xaniyek çêkırıbû me
Jı qûmê coyê
Nızanım hê lı wê ye...

Dema ku baran
hûr hûr tête jı esman
Dema ku bihna xakê
dıkeve nava kulilkan
Dema ku viçe viça çûkan
dertê jı hêlinan
Tû tê bira mın
Gundê mın.

ISBN 975-6925-03-5
9 789756 925034